# ÇAND Û SINC

## NAVÎN

## 2

**2020/2019**

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Çand û Sincê ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**- Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


## Beşa 1: Çand û Sinc ........................................ 7

Çand ........................................ 8

Sinc ........................................ 10

Şêweyê Jiyana Civaka Xwezayî ........................................ 12

Baweriyên Civaka Xwezayî ........................................ 15

Totem ........................................ 17

Perestgeh ........................................ 19

Mîtolojî (Mythology) ........................................ 22

Pergala Desthilatdariyê ........................................ 24

## Beşa 2: Pêşketina Gund û Bajaran ........................ 27

Pêşketina Gund û Bajaran ........................................ 28

Pêvajoya Pêşketina Gundan ........................................ 30

Sincê Gundewariyê ........................................ 32

Bajarvanî ........................................ 34

Xerabkirina Çand û Sinc -1 ........................................ 36

Xerabkirina Çand û Sinc -2 ........................................ 39

## Beşa 3: Komên Ziman ........................................ 43

Ziman ........................................ 44

Koma Zimanê Çanda Arî (Aryen) ........................................ 46

Koma Zimanê Çanda Samîtîk ........................................ 48

Koma Zimanê Ûral Altayî ........................................ 50

## Beşa 4: Di Çand û Sinc de Bawerî. ........................ 53

Çand û Sincê Ariyen di Baweriya Zeredeşt de ........................ 54

Çand û Sincê Ariyen di Baweriya Manî de ........................ 56

Çand û Sincê Hindî di Baweriya Bûda de ........................ 59

Çand û Sincê Ûral Altayî di Baweriya Konfiçyûs de ........................ 61

**Çand û Sincê Latînî di Baweriya Sokratês (Socrates) de............. 63**
**Çand û Sincê Samîtîk di Baweriya Hz.Îsa de ................................ 65**
**Çand û Sincê Samîtîk di Baweriya Hz. Mihemed de..................... 68**

# Beşa 1: Çand û Sinc.


- **Çand**
- **Sinc**
- **Şêweyên Jiyana Civaka Xwezayî**
- **Bawerî û Civak**
- **Totem**
- **Perestgeh**
- **Mîtolojî**
- **Pergala Desthilatdariyê**



**Wane 1**

# Çand

Em dikarin pênaseyeke giştî ji çandê re bidin xuyakirin ku çand hemû wate, perensîb û sazûmaniyên ku mirov bi hezarên salan ava kirine. Perensîb tê nasîn ku ew hemû nirx û saziyên ku ji guherînê re vekirîne.



Heyîna wateyan ew hişmendiya di nava wan saziyan de ye. Çand ji du beşan pêk tê "Heyberî û Rewanî", weke mirov di beden û giyanê xwe de.

Mirov hem bi giyanê xwe û hem bi bedena xwe hebûnekê çêdike. Nabe ku mirov xwe ji yekê ji wan dûr bixe yan jî vala bike.

Çand bi hişmendî û sazûmankirina civakî, xwe diyar dike.

Çand di wateya xwe de, jiyana civakî, zagona sincî, hizir, huner, zanist û yekbûna saziyan e.

Ji ber vê yekê em nikarin heyîna civakeke bêçand nas bikin, ji ber ku çand di bingehê xwe de hem hişmendî û hem sazûmaniyeke civakî ava dike. Dema ku em civakekê lêkolîn dikin, bê ku bingehekî wê yê çandî hebe, em di vir de bi vê civakê têne xapandin. A rasttir em dikarin bibêjin ku ev hin komên mirovan in ku ji bo berjewendiyên xwe hatine li gel hev, lê tu girêdanên çandî di navbera wan de tune ne; ji ber ev kom ne sazûmankirî ne û hişmendiyeke hevbeş di navbera wan de tune ye.

Em nikarin li ser hişmendiya civakekê yan jî çanda wê biaxivin, dema ku rêxistina wê civakê têk çûbe. Ji ber rêxistin weke peyaleke tijî av e, dema ku ev peyal bişkê ew av jî namîne. Dibe ku ew av bibe hêmana jiyana civakên din; ji ber ku civakên ku çanda xwe neparêzin, ew çand belav dibe û dibe ku wenda jî bibe. Lê dema ku ew peyal vala be, wê demê civak bi giranî her tiştên xwe wenda dike û ji dagirkeran re dibe armanc.

Encamên wendakirina wate, hişmendî û xweşikbûna civakî, civakê bê kok dihêle. Civak ji her tiştên xwe yên pîroz dûr dikeve. Bi wateyeke din civakên ku hişmendî û xweşikbûna civakî wenda kiribin, weke berateyekî ku li çolê avêtî ye, bîn pê ketiye û bûye armanc ji nêçîra geyanweran re.

**Li ser vî bingehî, ji bo pênaseya civakeke xwedîçand, pêwistî bi nirxandineke giştî heye ku li ser sazî, wate û rêxistina wê civakê bê kirin.**

## Pirsên Nirxandinê

- Çand çi ye? Lêkolîn bikin.

**Wane 2**

# Sinc

Armanca me avakirina civaka sincî û ramyarî ye.

**Sinc,** kevneşopiya hizirandina hevbeş e. Ji hemû pîvan û rêgezên ku civakê ji bo hebûn, parastin û pêşketina xwe kirine, **''Sinc''** tê gotin.
Têgeheke ku bi hebûn û tevgera civakbûnê ve girêdayî ye û derketiye holê. Têgeha sinc, bi têkilî û tevgera civakê re hebûna xwe didomîne.
Carinan sinc bi awayekî ramyarî ye û bi rewşa kevneşopiya sazûmaniya dîrokî tê nasîn, lê sinc bêhtirî ramyariyê bi rola afrînerî, parastin û têrkirinê radibe.



Sinc bîrgehê civakê yê ramyarî û jiyanî ye, ji ber vê yekê civakên bêsinc bîranînên wan ên ramyarî û jiyanî pir lawaz in û hêza sazûmanî û bingehê kevneşopiyê ji wan dûr in, ev tê wateya ku civak xwe neparêze, hemû derfetan li pêşiya dagirker û desthilatdaran vedike. Karê despêkê yê ku sîstemên desthilatdar xwe pê ava dikin, qirkirina sincên civakê ye. Piştre ev sîstemên desthilatdar zagonan bi zorê, li şûna sincên civakê

bi cih dikin û wê civakê digihînin rewşekê ku her dem desthilatdariyê li ser xwe bipejirîne.

## Civaka sincî tê çi wateyê?

Di nava komên mirovên yekem de hemû liv û lebatên ku ji bo xwe kirine, bi hinek rêbazan pêk anîne. Rakirina kevirekî ji erdê, komkirina şînatiyekê û kedîkirina lawirekî, ev hemû tevgerên wê demê ne. Ev bi hin rêkûpêkiyên tevgerên mirovan re hatine eşkerekirin. Mirovên wê demê ji bo civakê kar kirine û ev kar ji bo civakê bi hin rêgezan dane berdewamkirin ku bûne çanda civakê û pê ve hatine girêdan, pê re têgihiştin û rêgezên sincî dane avakirin. Wê demê sinc dibe rêgeza bingehîn a tevgerkirinê.

Civak bê sinc nabe, ji ber vê yekê hemû pergal û berjewendîperest li pey xerabkirina sincên civakê planên xwe ava kirine. Civakek bê sinc bimîne, wê zû ji rêya rastiya xwe derkeve û were rûxandin, guhertin û dagirkirin. Ew civak, ji cewher û hêza xwe tê dûrxistin.

Ji ber vê yekê, çand û sincên civakê ji bo deshilatdaran bûye mijara sereke ya ku her tim li dijî wê pilan tên amadekitin û dixwazin ku civak bê sinc bimîne.

Bê sinc civak û mirov nikarin jiyaneke durist bidomînin.

Sincên civakê, dema ku ji destê wê tên girtin, bê bingeh dimînin. Weke dareke hişk, nikare hebûna xwe bi rêgezên xwe berdewam bike.

Berî avakirina şaristaniyên dagirker, civak bi bawerî, sinc û demokrasî bi hev re dijiyan.


### Pirsên Nirxandinê

- Sinc çi ye? Civaka sincî û ramyarî lêkolîn bikin.

**Wane 3**

## Şêweyê Jiyana Civaka Xwezayî

Eger mirov dabaşa dema civaka xwezayî û mirovên wê demê bike, divê ew şert û merc bi awayekî baldar û bi hemû zehmetiyan, werin hizirîn. Di van deman de şert û mercên xwezayê, weke niha dest nadin ku mirov jiyana xwe bidomînin. Komikên civaka xwezayî negihaştibûn ku cil û bergan nas bikin. Ta demeke pir dirêj ji bo ku xwe ji wan şert û mercên xwezayê biparêzin, hizirîne ku ji bo xwe cil û bergan çêkin. Ew dihizirin ku li cihên parastî bigerin, ji ber vê xwe li şikeftan digirtin û xwarina xwe kom dikirin. Ev bûyer, gelek girîng in. Ji ber ku, di wê demê de demsal weke niha ne hêsan bûn, gelekî sar; an jî gelekî germ bûn. Hîn mirov parastina xwe ji pergala xwezayê weke niha tam amade nekiribûn. Ba, baran, bahoz, berf û qeşa zêdetir bandor li jiyana wan komikan dikir. Li ber çavên van komikan, her tişt çêdibin û diqewimin. Herî zêde, çavdêrêya lawiran dikin. Weke wan tevdigerin.



Hizirandina mirov a wê demê ji ber van şert û mercan, xwe gihandiye asta xwebicihkirinê, lê belê herî zêde ev lêgerîn di jiyanê de bipêş ketiye. Sedemên vê lêgerînê pir girîng in. Ji ber ku, di nava komikê de herî zêde mirov bi van şert û mercan tev digere û hemû derdora xwe bi çavdêrêya xwe dişopîne û xwe digihîne asta xweparastin û bicihkirinê. Lê belê, di serdema civaka xwezayî de ev tevger, dibin çanda yekemîn a van komikan. Bi hin tevgerên wekhev êdî hev û du dişopandin.

Ji bo ku hev bişopînin, divê bikaribin bi hev re biaxivin, bidin û bistînin û ji hev tê bigihêjin. Hatiye gotin ku mirovan hemû lawirên wê demê şopandine. Lê belê, lawir naxivin. Ev yek afirandina mirovan derdixe holê. Ji bo bi hev re jiyan bikin û bidin û bistînin, bingehê axaftinê ava kirine. Qirika xwe bi kar anîne. Ji bo pêdiviyên xwe dest û lingên xwe bi kar anîne. Ji bo van hemûyan, çav û mejiyê xwe bi kar anîne. Her wiha, hêdî hêdî ketine cudahiya xwe. Ev cudahî, ji bo mirov pir girîng bû. Hemû pêşketinên din jî, bi van tiştan ve girêdayî bûn. Di van şert û mercên herî zor de ji bo ev komik jiyana xwe bidomînin, xwe gihandine gelek hilberînan. Ev hilberîn, ji bo wan bûne hebûnên pîroz. Niha jî, wisa ye. Dema mirovek hebûnekê bi destên xwe ava dike, lê xwedî derdikeve.

**Mînak:** Dema ku mirov xaniyekî ji xwe re ava dike, her sal di demsala payizê de derdor û li ser xaniyê xwe diseyîne.

## Civaka xwezayî û pêşketinên ku çêbûne:

- Gava yekem a mirovbûnê ye.
- Avakirina yekem e.
- Hizirandina mirov a yekem e.
- Mirov, cara yekem bi civaka xwe hebûna xwe bi lêv û nav dike.
- Mirov dest bi axaftinê dike.
- Di navbera başî û xerabiyê de digihêje têgehên nû.

- Xwe dinase. Wateyê dide xwe û derdora xwe.

Dema ev taybetî bi mirov re bi pêş dikevin, êdî cudahî dikeve navbera wan û zindiyên din. Ev gava yekem, dibe sedem ku kom û şêweyê jiyana mirov a bihizir derkeve holê.

Bê guman, lawir jî dihizire, lê ne bi plan e, nikare xwe bi bername bike. Nikare bi hizirên xwe, tiştên nû biafirîne. Dema ku mirov ev tişt fêm kirin û jiyana xwe bi plan û bername kir, xwe ji komên din cuda kir.
Dibe ku ev di dema niha de ji bo me gelek hêsan be, lê ji bo zindiyên wê demê gihandineke nû û gaveke pir girîng bû.  Plan û bernamekirin, ne weke roja me ya îro bû. Li gorî xweza û pêdiviyên wê demê tev digere. Dibe ku cara yekem kevirek ji cihê wî rakiribe, ev yek bi hizir bi pêş dikeve. Dibe ku mêweyek ji darekê kiribe, ev yek bi hizir û plan bi pêş dikeve. Gelo îro bizinek, çima nikare giyayê ku jê hez dike biçîne; temenê bizinê jî, bi qasî temenê mirovan kevn e! Hişê wê jî heye, lê nikare xwarina xwe weke mirov amade bike. Ango, di navbera mirov û hemû giyanewerên din de hin bendên ku em bikarin ji hev cuda bikin hene:
**Bikaranîna hiş, çêbûna hişmendî, berpirsyarî, çand, sinc û hwd.**
Mirov dema dikeve cudahiya xwe, êdî ji bo xwe û jiyana xwe dest bi gelek afirandinan dike.

## Pirsên Nirxandinê

- Jiyana civaka xwezayî lêkolîn bike.

**Wane 4**

# Baweriyên Civaka Xwezayî

Di civaka xwezayî de, ew hebûnên ku ew bi xwe diafirînin, ji bo xwe pîroz dibînin. Klan van hebûnan, weke parçeyekê ji xwe dibîne. Ev dibe sedem ku hestên erênî bi wan re bi pêş bikevin. Ev jî, ji bo klanê bandoreke mezin e. Êdî mirov digihêje astekê ku hizir û hestên xwe bi hev re bixebitîne û ji bo derdora xwe bi kar bîne. Ji ber vê yekê, hemû hebûnên derdora xwe zindî dibîne.



Bi hizirandinê, çanda mirovan bi pêş dikeve. Ev çand, piştre dibe weke taybetiya wan a bingehîn. Hemû komik li derdora hebûnên xwe kom dibin û baweriyê ji xwe re ava dikin û pîroz dikin.

Ev bihevrebûna hest û ramanên wê klanê, nîşan dike. Ev bihevrebûn dibe bingehê baweriyên wan klanan.

Di heman demê de dibe taybeiyeke mirovbûnê ya xwezayî. Bi hest û ramanên xwe û bi çavdêriya derdora xwe wan pêk tînin. Ev bihevrebûn di heman demê de dibe wijdana yekem a civakê. Li gorî vê, em dikarin bibêjin ku civakbûyîn bi hevkariya jiyana klanên destpêkê yên ku li derdora jinê kom bûne, dest pê kiriye.

**Anîmîzim:** Şêweyê yekem ê bawerî, nirxdayîn, hezkirin û watedayîna jiyanê ye. Mirov xwe û derdora xwe zindî dibîne. Her tiştî li derdora xwe zindî dibîne û bi nirx dike. Mirovên wê demê tevî ku jiyana xwe bi zehmetî derbas dikir, xwedî li heyînên derdora xwe derdiketin û ziyan nedigihandin tu zindiyên din.

Anîmîzim weke têgîn di bingehê xwe de latînî ye, ji hêla antirpolojiyê (zanista mirovahiyê) îngilîz **Edward Tylor (Êdward Taylor)** hatiye binavkirin. Ev têgîn tê wateya giyan yan jî jiyan, lê weke sîstem, ew bawerî bi hebûna giyanan di cîhanê de ye, bi gotineke din her tişt di cîhanê de zindî ye, ta bi kevirê ku qet nalebite giyanê wî heye û zindî ye.

Anîmîzim bawerî bi giyanê xwezayê û girêdana mirov bi civak û xwezaya wî re ye. Di roja me ya îro de jî hîn anîmîzim berdewam e.



Li Japonyayê anîmîzim bi navê (Şentû) diyar dibe ku ew giyanê xwezayê ye û li her deverê heye.

Di ola hindûsî de jî anîmîzim heye ku ew ji giyanên xwedayê xwe re li mêj dikin, di nav gelên resen ên Amerîka de û li gorî lêkolîneran ku ev gel ji koka xwe ve bi anîmîzimê re jiyana xwe ava kiriye û didomîne.

## Pirsên nirxandinê

- Anîmîzim, lêkolîn bike.

**Wane 5**

# Totem

Di nava komikên xwedîklan de rastiya herî mezin, azadî û wekhevî ye. Civaka yekem, bi awayekî azad li hev kom dibe û bi parvekirina hemû nirx û berhemên xwe wekheviyê pêk tîne.



Ango, azadî û wekhevî di dema klanan de, di bingehê civakbûna yekem a li derdora **jin-dayîk** dijî. Ev rêgez, weke îro ne, bi hin xal û bendan hatine diyarkirin.

Pîvanên jiyanê, bi tevgera pêdiviyên komikê ve girêdayî ne, ev rêgez eşkere bûne. Bi wijdana mirov re xwe dane der.

Zanabûna yekem, totem e.

Totema civakê, nîşana baweriyê ye.

Ji bo civak û komikên civaka xwezayî, totem weke nirxên jiyanê hatiye pejirandin. Ji ber ku mirovên wê demê, li gorî xweza û bûyerên xwezayî nêzîkatî û hezkirina xwe dikir; hem ji wan ditirsiyan û hem jî rêz didan wan.

Li derdora wan kom dibûn. Ew weke tiştekî pîroz didîtin. Piştî ku wateya wan fêm dikirin, ew ji bo xwe bi heman pîroziyê bi kar tanîn.

Weke dar, kevir, lawir, av, roj, birûsk, giya û bi taybetî jin. Ji ber ku dema zayîn û hilberînên jinê dibînin, wê ji bo xwe bi awayekî pîroz digirin dest, li wê guhdar dikin û li derdora wê kom dibin.

**Mînak:** Weke nekuştina lawiran, xwedîkirina zarokan, parastina hev û du û parvekirinê. Ev, rêgezên yekemîn ên sincî ne.

Jin bi erkê duristkirina civaka xwe rabûye. Gelek giya û şînatî bi kar anîne. Çandina şînatiyan û kedîkirina lawiran nas kiriye. Ev komik ber bi cîwarbûnê ve birine. Ev baweriya ku bi jinê ve girêdayî ya totemên destpêkê ye û hilberînên jinê yên destpêkê pîroz hatine dîtin.

## Tabû:

Gotinên ji tiştên ku di civakê de qedexe ne re tê gotin, yan jî têştên di civakê de pîroz in û nabe ku ev pîrozbahî bê reşkirin.

**Tabû:** Nîşaneya kar û gotinên mirov ên qedexekirî ye, yên ku bi kevneşopiyên baweriya civakê re girêdayî ne.

**Mînak:** Di civaka me de eger kesek perçeyeke nan bibîne wê radike û datîne milekî, ji bo çûkên wê deverê dibe xwarin. Ew kes wî nanî pîroz dibîne û ji keda çêbûna wî nanî hez dike û wekî nirxekî xwe dibîne; ji ber vê yekê avêtina nan di civaka me de tabû ye.

### Pirsên Nirxandinê

1. Totem çi ye û çima civakê bawerêya xwe pê aniye?
2. Tabû tê çi wateyê ji civakê re?

**Wane 6**

# Perestgeh

Ew cihên pîroz ên ku civak li wan perestinê dike û wateyê dide jiyana xwe.



Perestgeh ne tenê weke cihê baweriyê ye, weke cihê hebûnê jî tê dîtin.

Perestgeha civakê, sinc, çand û hemû hebûnên civakê bi lêv dike. Bi taybet, di cihên xwe yên baweriyê de parvekirin û tevgerên xwe bi pêş dixin. Di nava wargehên xwe yên baweriyê de, ne tenê ji bo bawerêya xwe kom dibin, ji bo danûstandinên civakî jî kom dibin. Her wiha ji bo van hilberînan bi hev re parve bikin, kom dibin.

**Perestgeh:** Li gorî wateya teolojî (olnasî), cihên baweriyên olî, yên kevneşopî, çalakî, rêûresmên civakî û cihên perestxaneyên civakî ne. Perestgeh piranî weke cihên pîroz tên pejirandin. Mirov dikare perestgehan di du beşan de bigire dest.

**A yekem:** Ji aliyê wê yê avahî ve.

**A duyem:** Ji aliyê wê yê rewanî ve.

Avahiyên ku ji bo perestgehan hatine sazûmankirin ji milê xweşikbûn û teknîkê ve pir xurt in. Teknîk û nexşên ku hatine çêkirin, ji milê dîrokî, çandî û erkolojîk ve pir watedar û girîng in. Nexşe, xêzik û her wêneyên ku hatine çêkirin wateyek wan a dîrokî û çandî heye. Her komek, her civakek, her gelek, her çalakî û baweriyên heyî li gorî dîrok, çand, bawerî û şêwazê

jiyana xwe perstgehên xwe sazûman kiriye. Her civaka ku heyî li gorî bawerî û çanda xwe perestgehên xwe bi nav kirine.

- Li Kurdistanê li Xerabreşkê, navenda perestgehên civaka xwezayî hatiye avakirin û kevntirîn cihê perestin û baweriyê ye ku 12 000 BZ.

- Ji perestgehên Zerdeşt re "Agirgeh" tê gotin.

- Li Kambodiyayê, jê re "Angkor Wat" tê gotin û di cihanê de perestgeha herî mezin e. Aniha girêdayî ola bûdî ye.

- Ji Perestgeha Sih re "Gurdwara" tê gotîn. Ev perestgeh li Hindistanê li bajarê Artemîs di sala 2 574 BZ  ji aliyê Guru Ram Das ve hatiye avakirin. Jê re Perestgeha Zêrîn jî tê gotin.

Ji derveyî van perstgehan bi hezaran perstgeh hatine avakirin. Her gel û civak li gorî çand, sinc û baweriyên xwe perstgehên xwe dane avakirin û di van perstgehan de hem baweriyên xwe, hem jî pirsgirêkên xwe yên civakî çare dikin.



Her wiha li gorî lêkolînên dawî yên li Xerabreşkê (bajarê Rihayê, bakurê Kurdisatanê) hatiyê dîtin ku li ser rûye erdê, yekemîn navenda perestgehan li vir hatiye dîtin. Lêkolînên ku li Xerabreşkê hatine kirin, li vê qadê hatiye texmînkirin ku 20

parestgeh hene, lê ji van perestgehan heya niha şeş perstgeh hatine dîtin. Di encama van lêkolînan de, dema ku perestgehên Xerabreşkê hatine çêkirin, di wê demê de mirov bi komkirina giyayan û nêçirvaniyê bi awayekî komên biçûk jiyana xwe daye meşandin. Li gorî avahiya girê Xerabreşkê tiştên ku hatine dîtinin, tê texmînkirin ku hejmareke zêde ji mirovan, ji cihên zinaran stûnên mezin bi destan ji 2 km anîne girê Xerabreşkê. Di dîroka mirovahiyê de yekemîn car e ku hejmareke ev qas zêde li cem hev hatiye dîtin, ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku li Xerabreşkê konfidrasiyona klanan hatiye avakirin.

Klaus Schmet (Klawis Şimêt) ê ku birêveberê lêgerîn û kolandinê li Xerabreşkê ye, **dibêje:** "Hizira mirovên wê demê pir pêşketî bû. Mirovên wê demê ne hov in wek ku hin kes dixwazin bidin diyarkirin. Mirovên wê demê bi hizira xwe şaristanî ava kirine".

Dibe ku weke îro bi navê mizgeft û dêr nehatibin binavkirin, lê di wê demê de hevpariya civakê li van wargehên pîroz tê destgirtin. Jin û hilberînên wê, li wir pîroz in. Weke bijîşk, mezina civakê û zanaya demê tê nasîn.

## Pirsên Nirxandinê

- Perestgehên ku te bi navên wan bihîstiye, lêkolîn bikin.

**Wane 7**

# Mîtolojî (Mythology)

Weke peyv mythology ji "**mytho**" û "**logy**" pêk tê. **Mytho** gotineke yûnanî ye, tê wateya "bi devokî ango bi gotinan şîrovekirina bûyer û tiştên qewimî", **logy** tê wateya "zanistê". Mîtolojî, bûyer û diyardeyên weke: Efsane, çîrok û vegotinên demê şîrove dike; ya rasttir, bilêvkirina rastiyê ye.

Mirovên ku li cîhanê jiyane, gelek mîtolojî ava kirine, avakirina mîtolojiyan sedema wê nedîtina bersivên gelek pirsên girêdayî jiyana wan bû.

Mirovên ku mîtolojî çêkirine ji zanist û ola niha dûr in, mîtolojî dibe weke bersiva ji van pirsan re:

1- Cîhan çawa çêbûye?
2- Mirov çawa çêbûye?
3- Em kî ne û bi ku ve diçin?

Hin mîtolojiyên ku li Rojhilata Navîn hatine dîtin:

- Gilgamiş.
- Înana û Enkî.
- Îzîs û Ozîrîs.
- Promîsyos ( Promethyos).
- Şahmaran.

**Gilgamiş:** Dayîka wî xwedawend bû. Navê wê Nînson bû û bavê wî mirov bû. Navê wî Lokalbanda bû, Gilgamiş nîvmirov û nîvxweda bû.

Gilgamiş ew e yê ku ji bo lêkirina sûrekî li derdora bajarê Urukê ferman dabû. Ya ku piştre bi destê Sergonê Ekadî hate hilwişandin.

**Destana Gilgamiş:** Kevintirîn destaneya niviskî, li ser rûyê cîhanê ye ku tê de Gilgmiş şahekî stemkar e, ji bo ku bajarê xwe ava bike pêwîstiya wî bi daran heye. Daristana nêzî wî parazvanên wê hene, ew jî Enkîdo û Humbaba ne. Gilgamiş ji bo ku Enkîdo bîne ser rêya xwe, wî bi rêya jinê dixapîne (Cara yekem di dîrokê de, jin weke amûreke xapandinê tê bikaranîn). Şerekî dijwar di nava Enkîdo û Gilgamiş de çêdibe, heft roj û heft şevan berdewam dike lê di dawiyê de tu kes bi ser nakeve. Piştre Gilgamiş û Enkîdo dibin hevalên hev û êrîşî daristanê dikin.



Humbaba li hember wan disekine û şer dike lê her du bi hev re wî dikujin. Enkîdo wekî xayinê yekem di dîrokê de tê naskirin. Piştre Enkîdo nexweş dikeve û dimre, Gilgamiş dema ku di mirina Enkîdo de dihizire, tirs dikeve nava wî û li şînatiya mayindebûnê digere û dibîne. Lê marek ji nava avê derdikeve û wê şînatiyê dixwe. Mîtolojiyên bi vî rengî pir in û piraniya wan li ser kevir yan jî li ser tablêtan hatine nivîsandin û hin mîtolojî bi rengekî devokî berdewam bûne, weke: Şahmaranê.

## Pirsên Nirxandinê

- Înana û Enkî.
- Îzîs û Ozîrîs.
- Promîsyos.( Promethyos)
- Şahmaran.

- Yekê ji van mîtolojiyan lêkolîn bikin û naveroka wê diyar bikin.

**Wane 8**

## Pergala Desthilatdariyê

Avakirina çanda dayîkê bi hezarên salan hatiye berdewamkirin. Piştî wê demê, bi derketina hişmendiya deshilatdar re hilberînên zêde desteser dike û li gorî berjewendiyên xwe bikar tîne û çandeke dijber avadike. Rahibên qurnaz û bihêz, pergala deshelatdariyê, saz dikin. Weke Şaman, fermandarê leşkerî. Rahib di vê demê de bi pêş dikevin û sazûmaniya pergala desthilatdariyê ava dikin.



Hemû nirxên jinê û hilberînên wê, bi taybet ramanên wê tên dizîn û dîlgirtin. Weke ku gelek caran tê gotin, şkandina yekem a jinê, dest pê dike.

Ev guherînên civakî, ta niha didomin û dibin sedem ku di nava civaka mirovahiyê de du çand werin avakirin.

Yek çanda jin-dayîkê û yek jî, çanda zilamê qurnaz û bihêz.

Ev çand, di dema xwe de bi birêveberêya rahîbên sumeran saz bûye. Hemû çavkaniyên civakê, li gorî vê sazbûnê hatine desteserkirin û hiyerarşiya yekem li pêş ketiye. Ev pergal, bûye

rêya dijber ji çanda jinê re û hemû damarên civakê bi vê çandê hatine dagirtin û civak li gorî vê pergalê hatiye dabeşkirin.

Dabeşkirina civakê di zîguratan de eşkere dibe. Qata civakê ji jor ta jêr bi sazkirina cihê xweda, rahib û koleyan hatiye avakirin. Bi derketina pergala dewletê re, bîrdoziya bingehîn a çanda nêçîrvaniyê û bi demê re weke çand gav bi gav xapandin, li ser bingehê tirs û tundiyê bi pêş ketiye.

Bikaranîna tevahî şêwazên mîtolojî, bawerî, bîrdozî, huner û hwd re, pergala desthilatdariya zilam hatiye sazkirin.

Bi çanda nêçîrvaniyê re rê li ber komkujiya lawiran vebûye û bi şaristaniyê re jî rê li ber komkujiya mirovan vebûye; divê mirov xwe ji vê sîstemê rizgar bike.

## Pirsên Nirxandinê

- Pergala desthilatdar, çawa ava dibe? Encamên ku te jê girtine, bi hevalên xwe re parve bike.

# Beşa 2: Pêşketina Gund û Bajaran

- Pêşketina Gund û Bajaran
- Pêvajoya Pêşketina Gundan
- Sincên Gundewariyê
- Bajarvanî
- Xerabkirina Çand û Sinc 1
- Xerabkirina Çand û Sinc 2



**Wane 1**

# Pêşketina Gund û Bajaran

**Gund:** Ew deverên niştecîbûnê yên ku hejmara şêniyan tê de hindik e û bi çandinî û lawirvaniyê debara jiyana xwe dikin.

**Bajar:** Ew deverên niştecîbûnê yên ku hejmareke zêde ji şêniyan dihewînin û aboriya wan bi giştî li ser tekiliyên bazirganî, pîşesazî û hwd e.

## Derketina Gund û Bajaran.

Ji bo ku civak jiyana xwe bidomîne, çend pêdiviyên wê yên jiyanî hene: **xwetêrkirin, xweparastin û xwezêdekirin.**




Di nava pêvajoya civakbûnê de, ev her sê pêdivî ji aliyê heyberî ve bûne zemînên pêşketina civakê. Bê guman, ev her sê pêdiviyên jiyanî, ji bo giyanewerên din jî pêwîst in. Ew jî xwe têr dikin, xwe diparêzin û xwe zêde dikin. Lê belê, pêkanîna van pêdiviyan, li cem mirov pir cuda ye. Mirov ji van aliyan ve jî xweser in, taybetiyên wan ên cuda hene. Berî her tiştî, mirov dema ku xwe têr dike, xwe diparêze û xwe didomîne. Li ser bingehê zanabûn û vîna xwe ya azad tev digere. Ev jî dibe sedem ku zemîna xwe ya jiyanê bi xwe biafirîne û cihê ku lê dijî li gorî

pêdiviyên xwe biguherîne, heta qonaxa **Mezolîtîkê** (20000-12000 BZ). Şinatî û lawir ji aliyê taybetî, hejmar û belavbûnê ve bersiva pêdiviya civakê dida.

Erdnîgarî û avhewa jî, ji bo jiyaneke bicîbûnê ne guncaw bûn. Zanabûn û serboriya civakî têrî jiyana niştecîbûnê nedikir. Ji ber van sedeman, ta qonaxa Mezolîtîkê civak bi şêweyên koçerî dijiya.

## Pirsên Nirxandinê

- Sedem avakirina mirov ji gund û bajaran re çi bû?

**Wane 2**

# Pêvajoya Pêşketina Gundan

**Gundewarî**, di encama çandinî û pêvajoya civaka Neolîtîkê de ya ku jin-dayîkê jê re pêşengî kiriye, derketiye holê û bi pêş ketiye. Ji ber vê jî, taybetiyên gundewariyê, çavkaniya xwe ji çandinî û pêşengiya jin-dayîkê digire.

## Têkiliyên di navbera çandinî û gundan de:

Avakirina gundan, girêdayî çandinî û lawirvaniyê ye. Di nava pêvajoya hezarên salan de, civakê bi dostanî, hezkirin û rêzgirtinê, xwe nêzî xweza û hemû heyinên di nava wê de kiriye.



Ev nêzîkatî bûye sedem ku derbarê wan de nasîneke baş û kûr çêbe.

Giyayên ku kom kirine, lawirên ku nêçîra wan kirine û tiştên ku rastî wan hatine weke, dar, kevir û kanzayên ku weke amûr bi kar anîne, êdî taybetiyên wan nas kirine.

Bi demê re fêrî çandina şînatî û daran bûne.

Xwarina şînatiyan ji hev cuda kirine û ya ku pêdiviya wan zêde pê hebû, giraniya xwe dane li ser wê. Bi vî awayî, di serî de **genim, ceh, garis, nok, nîsk** û gelek xwarinên din jî pîroz dîtine. Lawirên weke: **ga, beraz, bizin, mirîşk, kûçik** û gelek lawirên din jî, weke lawirên pîroz dîtine û nirx dane wan.

**Ba, baran, berf, roj, heyv, birûsk** û taybetiyên wan nas kirine, her wiha bandora wan li ser jiyan û civakê hatiye naskirin.

Ax û sûdên wê ji bo civakê nas kirine. Ji kîjan axê xanî çêdibe, dexl û şînatî di nava kîjan axê de tên çandin, avdanî çawa dibe û hwd. Ev zanînên ku fêrî wan bûne û pîroziyên ku derketine holê, bûne bingehê avakirina gundan.

Li deverên ku gund hatine avakirin, pêwîst e ev dever berî her tiştî ji bo ewlekariyê guncaw bin û daristan, gir, gol û newal lê hebin. Wekî din, pêwîst e ku av jî hebe; ji ber ku bê av jiyan bi rê ve naçe û ji bo çandinî û lawirvaniyê jî av tişta herî sereke ye. Erd, ji bo çandinî, çêreya lawiran û çêkirina xaniyan guncaw e. Pêwîst e heyberên weke: **ax, kevir û dar** hebin, ji ber ku bêyî wan, çêkirina xanî û amûran ne gengaz e.

Gundên destpêkê nêzî çem, robar derya û çiyayan hatine avakirin. Ji ber ku çandinî, vexwarin û paqijî bê avê ne gengaz in. Av ji bo çûn û hatin û veguhestina berhemên çandiniyê jî dihat bikaranîn. Her wiha di nava hezarên salan de civakê, xwe fêrî bikaranîna avê jî kiriye. Cihokên avê û sarinc hatin çêkirin. Bi alîkarêya van pêşketinan, êdî gund li deverên dûrî çeman jî hatin avakirin. Di gundên destpêkê de xanî piranî bi ax û daran dihatin avakirin.

## Di Çanda Gundan de Bandora Jin-Dayîkê:

Di avakirin û pêşxistina çanda gundan de, cihê mêr jî hebû. Lê belê ya ku rêberî û pêşengî dikir, **jin-dayîk** bû. Ji ber ku di nava pêvajoya dîrokê de ya ku herî zêde bi ax û şînatiyan mijûl dibû, **jin-dayîk** bû. Çandiniya şînatî, xwedîkirina lawiran, çêkirina xanî û firaxan, bikaranîna axê û gelek berhemên din jî encama afirîneriya **jin-dayîkê** ne. **Jin-dayîk** ji ber ku di şoreşa gund û jiyana niştecîbûnê de diyarker bû, muhra xwe li çand û sincên gund jî xistiye. Ji ber vê sedemê, civaka çandinî û çanda gundewariyê weke çanda **jin-dayîkê** tên binavkirin.

### Pirsên Nirxandinê

- Sedemên avakirina gundan û rola jin-dayikê, lêkolîn bikin.

**Wane 3**

# Sincên Gundewariyê

Pîvan û rêgezên sincî yên ku di encama pêvajoyeke bi hezarên salan derketine holê, bûne bingehê çanda gundewariyê. Di heman demê de ew pîvan û rêgez bi çanda gundewariyê tên parastin û bihêzkirin.

## Sinc di civaka gundewariyê de:

Di çanda gundewariyê de jiyan, bi rêya sincan tê avakirin û birêvebirin.

Civak û mirovên gundewariyê dikarin pênaseya başî-xerabî, xweşikî-kirêtî û rastî-çewtî bikin û wan ji hev cuda bikin. Dizî, sextekarî, mêtingerî û gelek taybetiyên xerab, derveyî xwezaya çanda gundewariyê ne. Şîret, zargotin, çîrok, gotinên mezinan û gelek nirxên din, ji bo pêşxistina sincan tên afirandin û nirxandin.

Ger nêzîkatiyek, yan jî reftarek ji derveyî civakê derkeve holê, li hemberî wê tê dikoşiyan.

Pergala dadweriyê ya çanda gundewariyê jî, li ser bingehê sincan tê pêşxistin. Ji ber vê yekê, dadwerêya civakî bingeh tê girtin.

**Mînak:** Ger mirovekî dizî, derew an jî tiştekî din kiribe, civak wî/ê siza dike, mirov pê re naaxivin; ger tawana wî/ê giran be, wî/ê ji nav xwe dûr dixin.

## Hezkirina xwezayê:

Çanda gundewarî, berî her tiştî, jiyanek e ku bi xwezayê re lihevhatî ye, ango ekolojîk e.

Civak û mirov bi hezkirineke mezin nêzîkî xweza, ax, kevir, dar, şînatî, lawir û heyberên din jî dibin. Van tiştan weke hevalên xwe dibînin. Hezkirina xwezayê, ne bi gotinê ye, di heman demê de li gorî wê hezkirinê, tev digerin. Ev jî bi kedê dibe. Ango di çanda gundewariyê de civak bi hezkirin û kedê nêzîkî xwezayê dibin. Jixwe çandinî û kedîkirin, encax bi hezkirin û kedê pêk tên.

Ew dizanin ku jiyana wan encax bi av, ax, dar, lawir û şînatiyê berdewam dibe. Ji ber vê yekê, bi hestiyariyeke mezin wan diparêzin.

Jiyan bi awayekî xwezayî diherike. Danûstandinên di nava civakê de û di navbera mirovan de ne lasayî û sexte ne, lê belê axaftin, kar û reftar hemû xwezayî ne.

## Ked û nirx:

Jiyana gundewariyê li ser kedê tê avakirin. Bê ked tiştek çênabe. Her mirov, li gorî hêz û jêhatîbûna xwe kar dike; kesek bê kar tune ye.



Bi vî awayî, civak û mirov hemû pêdiviyên xwe pêk tînin. Ji bo hêzeke ji derveyî civakê, yan jî ne li gorî pêwîstiya civakê be, tu ked nayê dayîn. Ked bi diravan nayê firotin. Civak ji bo ku pêdiviyên xwe pêk bîne, kedê dide û kar dike. Ji ber vê yekê, ked hem civakî ye û hem jî afirîner e. Keda gundewariyê, keda afirîner û hilberînê ye. Çawa ked civakî ye, nirxên ku derdikevin holê jî civakî ne. Nirx û berhem ji bo civakê û hemû endamên wê tên afirandin û hilberandin. Tiştek bê nirx tune ye, ji ber ku di encama ked û hezkirineke mezin de tê avakirin. Her berhem û kar nirxekî mezin tên dîtin. Nirx bi pîvanên heyberî nayên destgirtin. Di çanda gundewariyê de, nirx bi diravan nayên kirîn û firotin. Mirov bi diravan kar nakin, şînatî û mêweyên ku hildiberînin, bi diravan nafiroşin hev. Di nava xwe de parvekirin û belavkirinê pêk tînin.

### Pirsên Nirxandinê

- Sincên gundên derdora xwe binirxînin û bi hevalên xwe re giftûgo bikin.

**Wane 4**

# Bajarvanî

Li gorî belgeyên ku heta niha derketine holê, bajar piştî avakirina gundan hatine avakirin. Derfetên gundan bisînor in, lê tevî van derfetan, gund pêwîstiyên xwe dabîn dike.

Li derdora Kendava Besrayê çanda **Elubeyd** bi du çînan jiyan dikir û gundên mezin ava kiribûn.

Çîna koleyan û çîna seredestan, bi çandiniyê û bikaranîna avê jiyana xwe berdewam dikir. Lê piştî zûhabûna rûerdê, ev gundên mezin berê xwe didin Mezopotamyayê û bajarê **Erîdoyê** ava dikin. Ev çanda bajarvanî xwe bi dijbertiya gundên şoreşa çandiniyê nîşan dide. Zêdebûna şêniyan û bazirganî têrê nake ku bajar were avakirin, ji ber vê yekê hêzek ji dervî ci6vakê derdikeve û bajar ava dike.

Gilgamiş mirovan kom dike û li dijî Kîş derdikeve û bajarê Urukê ava dike.



Li gorî Henry Frankfort (Hênrî Frankfort) sedema sereke ya çêbûna bajar, heyrareşî ye. Êdî mirov tenê ji bo jiyana xwe derbas bike nema dihizire, ji vê yekê bêhtir hewl dide ku her tiştî bixe bin desthilatdariya xwe.

Li Misira kevin, pesndayîna qiralan, bi avakirina bajaran tê kirin.

Bajar li hember çand û sincên gund, tên avakirin. Pê re, bajar bi keleh, dîwarên stûr, perestgeh, şaman û qiralxweda bi pêş dikeve. Êdî desthilatdarî xwe li bajaran bi rêxistin dike û êrîşî gundan dike.

Di encameke wiha de û li gorî dîrokê, bajar li ser keda gundan û diziya berhemên wan hatiye avakirin. Gelek çand, ziman, êl û netew di bajar de tên gel hev û bi hev re dijîn. Bajar van hemû cudahiyan di bin sîwana xwe de kom dike û bi vî awayî nasnameyeke hevpar a wî bajarî derdikeve holê. Di heman demê de civaka bajar, dibe xwediyê nasnameyeke xweser û weke nasnameya **bajarî** tê binavkirin. Bajar, warek e ku ji gelek pêkhate, çand, gel û neteweyan pêk tê û tê de gelek bazirganî û pîşe hene, lê hejmara nişteciyan zêde ye. Ev, dibe sedem ku pirsgirêkên kar, xebat û pêdiviyan zêdetir û zehmetir bibin.

Di encamê de ramyarî, maf, saziyên fermî û zagonên nivîskî derdikevin pêş. Ji her bajerekî re, li gorî civak, çand, erdnîgarî û mercên wê herêmê, divê rengek û nasnameyeke xweser hebe.

## Pirsên Nirxandinê

- Bajar çawa hatine avakirin?

**Wane 5**

# Xerabkirina Çand û Sinc 1

Ji destpêka dîrokê heta niha, çand û sincên civakê li beramberî hemû zehmetiyan hebûna xwe domandiye. Di dîroka nivîskî (Sumer) de ji aliyê pergalên serdest ve li ser tunekirina çand, ziman, kevneşopî û sincên civakî kar kirine. Ev hizir, ji pêşketina çanda baviksalarî heta niha didome. Ev pênc hezar sal in ku civak tê xapandin û ev xapandin bi gelek rê û rêbazên cuda tê meşandin. Xwestine ku civakê ji rastiyên wê dûr bixin û di bin bandora hêzên serwer de, di asta koleyan de bixebitînin. Ji van rê û rêbazan re **pişaftin** tê gotin. Ji pişaftina ku hatiye pêşxistin, armanc ew e ku civak bê bingeh, çand û sinc bimîne.

Civaka ku ji sincên xwe dûr ketiye, ne ya xwe ye; ya serdestên xwe ye. Ji ber vê yekê, divê civak dîsa li giyan, hebûn, çand, ziman û sincên xwe vegere. Bi pêşketina çanda şaristaniya sumeran re, bingehê dewleta ku hatiye avakirin, bi bîrdozî û rêxistina xwe ya leşkerî û ramyarî, civak bi xwe ve girê daye. Ev girêdan, li ser heman baweriyê hatine pêşxistin. Lê di rastiya xwe de li ser bingehê pişaftina gelan hatiye destgirtin. Her wiha, ji destpêka pêşketina şaristaniya baviksalarî ve, çand û sincên civaka xwezayî hatine xerabkirin.

Civakên ku ji çand, ziman û sincên xwe hatin dûrxistin, bi demê re çand û sincên pergalên serdest, ji bo xwe pejirandine.

**Mînak:** Hin kurd, di roja me ya îro de, hewl didin ku bi zimanên biyanî bixwînin û zarokê xwe jî weke xwe bikin. Ev jî ji tirsa ku sîstemên serdest wan xistiyê de, ew jî hewl nadin ku xwe ji koletiyê rizgar bikin û li zimanê xwe xwedî derkevin; berevajî vê ew dijberêya ziman, çand û sincên civaka xwe dikin, ji bo ku koledar ji wan razî bin. Ev bû sedem ku gelek caran ne di wê zanabûnê de bin; ka gelo çand û sincên pergalê dijîn, an jî bi çand û sincên xwe nûnerêya xwe dikin!

## Çanda çêkerî

Çanda ku ji aliyê pergalên desthilatdar ve û bi rêya gelek amûran hatiye pejirandin, bûye çanda çêkerî. Dikare weke çanda sexte jî were binavkirin û pênasekirin.



Ev diyarde, dibe sedem ku civak û mirov ji xeyal, armanc, helwest û daxwazên xwe yên azadiyê dûr bikevin. Bêyî xwesteka pêşxistina jiyana xwe bimînin. Çanda çêkirî, di civak û mirovan de asta pêşketina hişmendî kor dike. Ji dîrok û nirxên xwe dûr dixe. Bi gelek rê û rêbazan tê bikaranîn. Ev çanda sexte, çanda nîgaşî, piranî ji aliyê çapemeniyê ve tê bikaranîn. Tê zanîn ku teknîk û teknolojiya ku îro pêş ketiye, ji aliyê her mirovî ve tên bikaranîn û bi pêşketina teknîka heyî re her mirov dikare bi ragihandin û danûstandineke ji nêz ve bikeve nava hewldaneke rast de. Ev pêşketin, ji aliyekî ve pêşketina civak û mirovan e. Lê belê, ji aliyekî ve jî bûye sedem ku civak û mirov bi çanda derveyî rastiya xwe ji her alî ve were fêrkirin.

Ji vî alî ve, dikare were gotin ku pêşketina teknîkê dibe ku ji aliyekî ve baş be, lê dema ji armanca azadî û daxwazên civakî hat dûrxistin û di destê desthilatdaran de bû amûra xerabkirina çandê, xerabiya herî mezin jî bi xwe re tîne.

Wê demê em dikarin bibêjin, civaka ku teknîkê li gorî armancên xwe baş bikar bîne, dikare helwestên xwe yên azadiyê baştir nîşan bide.

Birastî jî, ev xaleke girîng e, ji ber ku hemû pêşketinên çand û sincî li ser hîmê pêwîstiyên civakî hatine avakirin. Lê bi pêşketina şaristaniyê re bêsincî li ser hemû amûrên civakê hat meşandin, dagirkeriya pêşketî bû sedem ku ji armanca avakirinê dûr bikeve. Teknîk, di bin rajeya mirovan de tê bikaranîn, lê teknîka heyî, li dijberî çand û sincên civakê bi awayekî herî xerab tê bikaranîn. Ev jîbi rêya çanda çêkirî tê meşeandin.

## Pirsên Nirxandinê

- Bandora pejrandina çanda çêkerî li ser civakê diyar bikin.

**Wane 6**

# Xerabkirina Çand û Sinc 2



**Çanda lasayî:** Ew çanda şermkirina ji xwe û xweşikdîtina çandên derve û qutbûna ji hemû jêhatîbûnên xwe. Gelek dewlet û pergalan hewl daye ku cewher û çanda Rojhilata Navîn li gorî xwe bidin veguhertin, lê belê, kevneşopiyên Rojhilata Navîn çand û bandorên derve napejirînin. Ji ber vê yekê, êrîşên derve, di roja me de bi taybet çanda kapîtalîzmê li ser ciwan û jinan tê meşandin. Herî zêde di rêya çapemeniyê re tê xwestin ku çavên ciwanan her tim li derve be. Ev yek, dibe sedem ku pûtekirina çanda derve li cem ciwanan bi pêş bikeve. Lê belê, ev ne çanda vê civakê ye ku mirov bi şêwêyên lasayî dikeve nava tevgerên pûteyî de**,** lê divê were zanîn ku ew mirovên lasayiya çanda derve dikin, ji hemû xerabî û kirêtiya pergala derve re amade ne ku werin bikaranîn. Ji ber ku ev pûtekirin bi demê re mirovan ji hemû girêdanên wan ên civakî qut dike.

**Çanda dûrketina ji xwe:** Tê wateya ku mirov ji cewher, dîrok, rastiya civakî û kesayeta xwe dûr dikeve.



Mirovên ku ji xwe dûr dikevin, tenê ji aliyê rojane ve bi hin berpirsyariyên xwe yên kesî radibin. Dibe ku jiyana xwe bi hêsanî, yan jî bi hin derfetan derbas bikin, lê belê, nabin endamên berhemdar ên civaka xwe. Mirov dikare derbarê gelek sûdan de di nava civaka xwe de bibe xwedîçalakî, lê belê ew sûd dikeve

bin rajeya mirovên desthilatdar û serdestan de. Ji ber bi armanc û bi nirxên civaka xwe tev nagere, encama kar a ku were girtin jî encax weke xiniziya hundirîn were destgirtin.

Mirovên ku ji xwe dûr dikevin, bê vîn û hizirîna azad in. Di nava koma serdest de weke mirovên din, tên dîtin. Hemû mirov, wan derveyî xwe dibînin. Jixwe armanceke pergalê jî ew e ku civakan ji rastiya wan dûr bixe, di bin rajeya xwe de bi kar bîne, lê wan ji xwe, yan jî weke endamên xwe nabîne; ji xwe kêmtir dibîne.

Mirovên ji rastiya civak, çand û sincên xwe dûr dikevin, dibin mirovine din.

## Çanda pişaftinê:



Pergalên desthilatdar, gel û mirov (zarok, jin, mêr, kal, pîr) bi çand û sincên xwe ve girê dane û perwerde kirine. Gel, ji çand û sincên wî dûr xistine. Ev ji aliyekî ve dibe bêkokbûn, dûrketina ji rastiya civakbûna xwe û mayîna bênasname. Dibe amûrek ku ji aliyê her mirovî ve tê bikaranîn. Li xwe, mirovbûn, çand, sinc û hebûna xwe xiniziyê dike.

Tê xwestin ku gelê Rojhilata Navîn werin pişaftin, çima? Ji ber ku xwediyên çand û sincên herî dîrokî û mezin in. Bi çanda

bêserûber, bêkesayet, bêrêz, bêcivak, bêkok tê xwestin ku civaka Rojhilata Navîn xwe ji bîr bike û bibe weke wan.

Bi cilûberg, ziman, tevger, meş, hevaltî, rêzdarî, hezkirin û hemû tevgerên xwe dixwazin civakê bipişêvin; weke xwe lê bikin. Ev têkoşîneke bîrdozî ye, ne tenê guhertin û veguhertinên li ber çavan e. Bi hemû amûrên di bin destên xwe de (TV, Radyo, Înternet, Cîhana Nîgaşî) vê tekoşîna xwe ya bîrdozî bi civakan didin hezkirin û wan bê çand û sinc dikin.

Di nava gelên Rojhilata Navîn de gelê ku herî zêde hatiye bindestkirin, dagirkirin, pişaftin, qirkirin, kuştin û pûçkirin, gelê kurd e.

Ev jî, ji ber bîrdoziya pergalên serdest li dijî mirovahiyê hatiye pêkanîn. Di bin van êrîşên pergalê de bi deh hezaran mirov hatine kuştin. Êrîşên hovane hatine berdewamkirin.

Çawa ku her mirov ji bo ku bijî, gelek berdêlan dide. Her ku kurdan xwestiye gotinekê bi ziman, çand, sinc û nasnameya xwe bibêjin, bi heman êrîşan re rû bi rû mane. Bi hezarên salan ev êrîş pêk hatine û hîn jî didomin.

## Pirsên Nirxandinê

- Xerabkirina çand û sincên civakê bi çi awayî hatiye meşandin?
- Çawa civakeke azad tê avakirin, lêkolîn bikin.

## Beşa 3: Komên Zimanan.

- **Ziman**
- **Koma Zimanên Çanda Arî (Aryen).**
- **Koma Zimanên Çanda Samîtîk.**
- **Koma Zimanên Çanda Ural Altayî.**










**Wane 1**

# Ziman

Asta pêşketina ziman asta pêşketina jiyanê ye.

Ziman bi gelek pênaseyan hatiye şîrovekirin, yek ji van pênaseyan jî dibêje: Ew deng in ku her gelek an jî netewek helwestên xwe pê derdixe.

Pênasekirina ziman ji milê wî yê erkdayînê ve, ji pênaseya rastiya wî û têkiliya wî bi mirov re cûda ye.

Ziman mirov, welat û malbat e. Ziman encama hizrandinê ye, ji ber vê yekê zimanên ku di cîhanê de belav bûne, li gelek beşan cuda dibin, her beşek bi xwezaya erdingarêya wî beşî bandor dibe (Aryen, Samîtîk, Ural Altayî, Çînî û Boantû) li milekî din hin zimanên din hene, lê ew ziman çêkirî ne weke zimanê lasayî yê kompîtorê. Li cihekî din ziman tê pênasekirin ku sîstema peywendiyên devokî û sembolî yên di navbera mirovan de ye.

Têkiliyeke xurt di navbera têgîna ziman û têgîna çandê de heye. Di çarçoveyeke teng de ziman bi awayekî bingehîn têgîna sereke ya qada çandê ye. Di çarçoveyeke fireh de mirov dikare ziman weke çandê jî bide naskirin. Ziman daneheva civakî ya hişmendî, sinc, hest û hizra estetîk e ku civakekê bi dest xistiye; ziman hebûna nasnameyî û hişmendî ya wate û hestên serwextbûyî ye. Civakekê zimanê xwe yê dayikê çiqasî bi pêş de biribe, ew tê wê wateyê ku asta xwe ya jiyanê jî bi pêş de biriye. Dîsa çi qasî zimanê xwe ji dest dabe û ketibe bin zaliya zimanên din de, ev jî tê wê wateyê ku ew qasî hatiye mêtin, qirkirin û pişaftin.

Civakên xwediyê vê rastiyê jiyaneke wan a watedar, hişmendî, sincî û estetîkî nabe û eşkere ye ku heta ji holê rabin, dê weke civakeke nexweş û di jiyaneke lasayî de bimînin.

Civakên wate, sinc û estetîka xwe ji dest bidin, nirxên wan ên civakî jî bi tenê ji bo nirxên mêtinkaran dibin heybera bikaranînê. Civakeke di vê rewşê de ji aliyê heyberî ve dê heta dawiyê xizan bibe û bikeve rewşeke parçebûyî ango gelekî eşkere ye ku ji aliyê wate, sinc û estetîkê ve dê bi şaşî û kirêtî bijî û nikaribe xwe ji vê rewşê derxe.


## Pirsên Nirxandinê

- Asta pêşketina ziman asta pêşketina jiyanê ye. Vê gotinê lêkolîn bikin.

**Wane 2**

## Koma Zimanên Çanda Arî (Aryen)

Koma zimanên arî, xwedînasnameya civaka Neolîtîkê ye. Zimanê arî di nava komên mirovan ên Mezopotamyaya Jorîn de bi pêş ketiye û bi rêya belavbûna çandê jî, derdora xwe bandor kiriye. Weke tê zanîn, cihê pêşiyên kurdan e, ên ku lê dijiyan, heta niha jî li gel kurdan peyva "aryen" tê wateya gotinên weke "cih, ax, zevî". Di heman demê de aryenî xwedîhilberînên çandiniyê ne.




Zimanê aryenî digihêje heta 12 000 salî BZ.

Di hilberînên xwebinavkirin û biwatekirinê de bi pêş ketiye û saz bûye. Hilberînên bingehîn: dîzik, kûzik, kêr, gîsin û gelek hilberînên din hatine binavkirin. Dema ku ev tên binavkirin, bingehê ziman jî çêdibe.

Gotinên yekem: "geo, war, ax, zevî, jin, roj, bira, mur, sal, neo, ga, giran, meş, xweda", ev hemû çavkaniya xwe ji çanda Mezopotamyayê digirin. Dengên qirikî ku derdikevin, weke

pergaleke pirdengî tên destgirtin. Ev, di erdnîgariya herî destgirtî, ya Mezopotamyayê de derfetê dide. Di heman demê de mirovên wê demê ku li Mezopotamyayê ev ziman ava kirine, li gorî lêkolînan, xwedîmejiyekî mezin in.

Hilberandina jinê tê pîrozkirin. Hemû vedîtinên ji vê serdemê wateya vê rastiyê piştrast dikin."Star" ku hîn jî tê wateya "stêrk"ê, di ziman û çanda afirînera serdema aryenî de tê wateya **xwedawenda jin.** Di zimanê wê herêmê de û di kurdî de îro jî, bi wateya Xwedê "Ya Star" tê gotin û ev yek mezinbûn û hêza baweriyê bi lêv dike.


Ev afirandin, gelekî kevn e û di hemû zimanên arî de hebûna xwe bi şêweyên cihêreng be jî, berdewam dike. Mirov dikare bibêje, buhişta yekem li vê kevana zêrîn hatiye afirandin. Mirovahiyê di warê jiyana civakî û hilberînê de muhra xwe li gelek pêngavên yekemîn xistiye. Amûr û qalibên mûzîkê yên wê serdemê, hîn jî bi awayekî, me bandor dikin. Di van komên ziman de weke zimanên kurdî, persî, hindî û zimanên ewropayî û hwd hene.

## Pirsên Nirxandinê

1- Zimanê kurdî koka xwe ji kîjan koma zimanan digire?
2- Bandora erdinîgariyê li ser zimanê xwe, lêkolîn bikin.

**Wane 3**

# Koma Zimanên Çanda Samîtîk



Duyemîn şoreşa mezin a zimanê sembolan, li rêzeçiyayên Toros-Zagrosê pêk hatiye.

Rista vê komê di şoreşa bajar û lawirvaniyê de sereke ye ku ev jî hêmaneke girîng a rastiya piştrastkirî ye. Di vê koma ziman de **akad, asûr, babil, kenan** hene û bi vî zimanî bi nasname dibin. Piştre **ereb** jî ji vê nasnameyê derdikevin. Di serdema me de ji vî zimanî re zimanê **Hamî-Samî**, tê gotin.

**Samîtîk:** Ji hin gelên ku zimanên wan nêzî hev in re tê gotin. Li gorî lêkolîneran, samîtîk li Erebistanê bi cih bûne û ji vê deverê belav bûne. Li ser vê belavbûnê bûne du beş Bakûr û Başûr, ên li cihê xwe mane bûne du beş.

1- Ereb, li Yemen û başûrê Kendava Besrayê.
2- Hebeşî, li berava Okyanûsa Hindê.

Hin kom ber bi kevana zêrîn ve çûne û bûne Rojhilatî û Rojavayî.

**Rojhilatî:** Akadî ne û dibin du beş babilî û asûrî.

**Rojavayî:** Ogarêtî û kenanî ne, kenanî jî dibin sê beş ibrî, fînîqî û qubtî; li Misirê bi cih bûne.

Akadî çûn Mezopotamyayê û Sumer bi aryenan re ava kirin. Lê piştre asûriyan berê xwe da Mezopotamiyayê. Kenanî çûne Deryaya Spî û Şamê. Hebeşî bi aliyê beravên Okyanûsya Hindê ve çûn, tenê ereb li cihê xwe man.

## Pirsên Nirxandinê

1- Koma zimanên samîtîk, lêkolîn bikin.
2- Koka zimanên suryanî û erebî li ser nexşeyê bidin xuyakirin.

**Wane 4**

# Koma Zimanên Ural Altayî

**Zimanên ural altayî û çînî:** Ev her du ziman pir di nav hev de ne û nêzî hev in. Sêyemîn koma mezin a zimanê sembolan, li başûrê daristanên Saybîryayê ji aliyê pergala êlên weke koma zimanê ural-altayî tên binavkirin. Ev komên ku axaftin li ser wan tê kirin, piştî serdema qeşayî heta bi Çîn, Moxolistan, Tirkistan û Fînlandaya îro belav bûne û bi qasî her du komên pêşî nebe jî, di dîroka gerdûnî de hem di warê Şoreşa Neolîtîk û hem jî di warê şoreşa bajarvaniyê de, kêrhatîbûna wan girîng e.

Malbateke ziman li Ewropa û Saybîryayê ye, ji du beşan pêk tê:

1. Zimanê çînî (ogrî).
2. Zimanê samûdî.

Navê xwe ji Ciyayê Uralê yê li Rûsyayê, girtiye. Ev malbata ziman 39 zimanan di nava xwe de dihewîne.

Hin welatên ku ev ziman li wan belav bûye jî ev in:

- Estonya, Fînlanda, Romanya, Rûsya, Slovakya, Hengarya.

**Boantû:**

Ev koma ziman nêzî 522 zimanan di nava xwe de dihewîne, piranî li Nîjerya û Kamîronê û li rojhilatê Afrîka, Gîne, Malawî, Mozambîk, Namîbya, Kongo û Angolayê belav dibe. Peyva Boantû bi xwe tê wateya (gel). Ev malbata ziman pir beşê wê hene: emazîxî, songayî, hawsa, emher, oromo, folanî,



yoropa, egbo, lîngala, kongo, tşîwa, soto, qoşa, efrîkana, malagaşî, beravî û nûbî.

## Pirsên Nirxandinê

1- Rol û belavbûna koma zimanên ural altayî diyar bikin.
2- Li Afrîkayê çend ziman hene û peyva boantû tê çi wateyê?

## Beşa 4: Di Çand û Sinc de Bawerî:

- **Çand û Sincên Aryen di Baweriya Zeradeşt de.**
- **Çand û Sincên Aryen di Baweriya Manî de.**
- **Çand û Ssincên Hindî di Baweriya Bûda de.**
- **Çand û Sincên Ural Altayî di Baweriya Konfiçyus de.**
- **Çand û Sincên Latînî di Baweriya Sukrat de.**
- **Çand û Sincên Samîtîk di Baweriya Hz. Îsa de.**
- **Çand û Sincên Samîtîk di Baweriya Hz. Mihemed de**.

**Wane 1**

## Çand û Sincên Ariyen di Baweriya Zeredeşt de

**Zeredeşt:** Derbarê sincê mirovahiyê de mînaka bingehîn e. Weke çand û sincên bingehîn di rêzeçiyayên Toros–Zagrosê de bi pêş ketiye û civakên vê herêmê bi vê çand û sincên xwe bi nasname kiriye.

Zeredeşt weke bawermend û fîlozofekî hatiye nasîn.

Di rastiya xwe de hizirînerê xwedîferaseta çand û sincên civakî ye.

Felsefeya Zeredeşt li ser bingehê dualîzmê ye (başî û xerabî, ronahî û tarîtî, xweşikî û nexweşikî).



*Zerdeşt*

Hizirîner, ev her du alî danîne holê û bi daxwazeke rast a mirovbûnê, bûye sedem ku mirov li ser van kiryaran bihizire.

## Nêrînên Zeredeşt ên li ser têkiliyên mirov û xwezayê:

Nêrînên Zeredeşt li ser têkiliyên mirovan (jin û mêr) girîng û balkêş in.

Di têkiliyên jin û mêran de wekhevî, hevkarî û rêzgirtinê bingeh digire. Ev rêgez, di heman demê de rêgeza malbat û civaka demokratîk e.

Keda mirov, çandinî û kedîkirina lawiran pîroz dibîne.

Serjêkirina lawiran qedexe dike û sûdgirtina ji hirî û şîrê wan çêtir dibîne. Ji ber vê yekê, rêbaza Zeredeşt a jiyanê bi keda xwe jiyîn e. Bikaranîna axê, çandinî û kedîkirina lawiran, weke karên herî pîroz dibîne.

Bi nirxên çanda Neolîtîkê ve yên girêdayî karkirin û hilberînan, jiyanê diparêze.

Bi xebatê, qezenckirin û zêdekirinê, weke taybetiya mirovên baş dibîne.

Rastiyê li ser xebata di navbera başî û xerabiyê de ava dike.

Zerdeşt, bi çanda xwe pêşî li jîngeha civakê jî vedike. Jîngeh, tê wateya cihê jiyanê. Ew şert û mercên ku mirov dikare tê de bijî, dibe jîngeh.

Di van gotinên Zeredeşt ên kurt de mirov dikare naveroka nêrîn û ramanên wî baş bibîne.

Tevgera bihizir û gavavêtina bihiş, weke taybetiyeke sereke ya mirov e. Başaxaftin jî wiha ye. Başaxaftin, weke cewherê kesayeta mirov e.

Sê nêrînên Zerdeşt ên di gotina wî de balkêş in:

**Baş bihizire, xweş biaxive, rast pêk bîne.**

Di dîrokê de van kesên ku bi berdêla jiyana xwe pêşengî kirine, navê xwe di dîrokê de bi tîpên mezin nivîsîne. Di dîroka kurdan de bi taybet, fîlozofê bi navê Zeredeşt, cihekî girîng girtiye. Bi ramanên xwe di bawerî û sincên mirovan de rêgez û pîvanên girîng bi pêş xistine.

## Pirsên Nirxandinê

- Baş bihizire, xweş biaxive, rast pêk bîne. Vê gotinê dahûrîne û mînakan ji jiyana xwe li ser diyar bikin.

**Wane 2**

# Çand û Sincên Aryen di Baweriya Manî de



Felsefeya Manîzmê di sedsala sêyem de ji hêla Manî ve tê afirandin. Wê demê weke senteza tevahiya olan dihat dîtin. Manîzm di naveroka xwe de dûalîzma Zerdeşt, folklora Babîlonyayê, rêgezên sincî yên bûdîstê û nirxên xirîstyaniyê dihewîne. Di vê pêkhatinê de rêgezên herî berbiçav, şerê di navbera başî û xerabiyê de ye. Ji ber vê yekê hinek dîroknas manîzmê weke oleke dûalîst dibînin. Ev felsefe hem li Rojhilata Navîn hem jî li Ewropayê gelekî bi lez belav dibe. Heta bakurê Afrîka, Îspanya, Fransa, Îtalya û Balkanê diçe. Lê pêşketinên herî mezin li erdnîgariya xwe li Mezopotamyayê bi dest dixe. Li Hindistan, Çîn û Tîbetê jî belav dibe.

Koka peyva Manî di zimanê aramî de ji “Mana”yê (wateya wê ronahî ye) tê. Wateya “Manî” weke ronîdanê hatiye şîrovekirin.

Navê Manî yê rasteqîn nayê zanîn. Lê malbata wî diyar e. Bavê wî Fatak Babak e, dayîka wî ji xanedana Arsaka Marmarjam e. Manî di sala 216'an de li bajarê Mêrdînê ji dayîk dibe. Manî di ciwaniya xwe de bi bavê xwe re dikeve nav rêya “Manakkede”yê. Bi perwerdeya olî re fêrî giftûgoyê dibe.

Manî cara yekem di 20'ê adara 242'an de di rê û resmên derketina sertext yên Şapûrê Yekem de derdikeve ser dikê, felsefeya xwe diyar dike û bi gel dide nasîn.

Manî demeke dirêj welat bi welat digere û felsefeya xwe dide nasîn. Di vê gerê de ji bo ku felsefeya xwe bi hêz bike gelek nameyên dirêj dinivîse. Di dema Şapûrê Yekem de tê girtin û dikeve girtîgehê. Piştî mirina Şapûrê Yekem azad dibe.

Cîgirê Şapûrê Yekem kurê wî Hûrmûzê Yekem, dema ku tê ser text piştgiriyê dide Manî. Lê desthilatdariya Hûrmûz tenê salekê didome. Di 274'an de kurê Şapûr ê bi navê Deryayam birayê xwe Hûrmûz ji text dûr dixe û tê ser text. Ev guhartin dawiya Manî jî tîne. Şahê nû ji ber ku bi mazdeyîzmê ve girêdayî ye ji felsefeya din re hişk e. Şah Deryayamê Yekem di 276-277'an de Manî bi sêdarê ve girê dide.

Pîvanên Manîzmê:


1- Bawerkirin bi dema borî.
2- Bawerkirina  bi dema pirxwedayî.
3- Derewan nekin.
4- Xerabiyê nekin.
5- Diziyê nekin.
6- Xwendin û teghiştina rastiyê.
7- Bawermendbûn (xwetêrkirina ji hizirê)
8- Karên kirêt nekin.
9- Nexwarina goşt, berevajî wê sûdgirtina ji lawiran.
10- Xebatkirin û zîrekbûn.

## Pirsên Nirxandinê

1- Manî kî ye û kengî derkitiye?
2- Xwesteka Manî çi bû?
3- Pîvanên manîzmê xal bi xal bi hevalên xwe re giftûgo bikin.

**Wane 3**

## Çand û Sincên Hindî di Baweriya Bûda de



Gotama Bûda (563-483 BZ) li Hindîstanê jiyaye. Bûda weke peyv tê weteya kesê zana, ronakbîr.

Bûdîzm yekem car li bakurê Hindistanê derketiye. ji malbateke dewlemend û mezin e. Li bakurê Hindîstanê weke mîr dijiya. Ji derve çi tê jiyankirin û jiyana gel çawa ye nedizanî, lê bi demê re hin tiştan dibihîze û bi gûmanan re jiyan dike. Di encama gûmanên ku jiyan dikir rojekê mirovekî belengaz dibîne û dinere ku pir belengaz e, lê pir bi dilxweşî jiyan dike.

Piştre hêdî hêdî dikeve nava civakê. Weke wan jiyan dike. Biryar dide ku çareyekê ji bo mirovên ku êşê dikşînin peyda bike.  Digihêje encama ku kêfxweşî û paqijîbûna jiyanê ne bi dewlemendiyê ve girêdayî ye, mirov dikare bi jiyaneke paqij jiyan bike.

Ji xwe Bûda navê xwe ji vê felsefeya xwe girtiyê. Ango Bûda tê wateya kesê zana, ronakbîr.

**Rêgezên Bûda:**

1. Biryardayîna rast.
2. Tevgerkirina bi rastiyan re.
3. Anîna gotinên baş ser ziman.
4. Raberkirina nêzîkatiyên rast.
5. Karkirina baş û rast.
6. Raberkirina hewldanên rast.
7. Xwenedîtina di ser kesekî din re.
8. Baldarî.

## Felsefeya jiyanê ya Bûda wiha ye:

Cîhan bi êşan dagirtî ye. Di bingehê êşan de xwestek, tirs û nezanî heye. Xwexilaskirina ji wan êşan gengaz e. Ev jî, bi rêya xwegihandina ronîkirina herî bilind, "Nîrvana" çêdibe. Nîrvana, tê wateya xwedayê ronahî û dilpakiyê û rêya vê Yoga ye. Yoga, ronakbûna bi zanînê, kûrahiya hundirîn, rê û rêbazên xwegihandina Nîrvanayê ye.
Felsefeya Bûda, li başûrê rojhilatê Asyayê desthilatdariya xwedatî ya Birahman şikand û bandoreke berfireh kir.

**Pîvanên bûdîzmê:**

1. Destdirêjiya malê kesî, neke.
2. Zindiyan nekuje.
3. Tiştên nerast nebêje.
4. Ji tiştên ku mirov serxweş dikin, dûr bikeve.
5. Rêzê bide jiyana mirovên din.

### Pirsên Nirxandinê

1- Bûda kî ye û bi çi bang dike?

2- Felsefeya Bûda, lêkolîn bikin.

Wane 4

# Çand û Sincên Ural Altayî di Baweriya Konfiçyus de



Fîlosofê Çînî yê bi navê Konfiçyus (551-479 BZ) hatiye naskirin ku bi sinc û felsefeya xwe, bandoreke pir mezin li Çîn û derdora wê kiriye. Wateya navê wî padîşahê feylesûf e. Gelê Çînî ew weke pêximberekî didît, lê ew dibêje ez miirovekî weke we me. Di zaroktiya xwe de pir zor û zehmetî bi dayika xwe re dîtine û ji bo ku jiyana xwe bidomîne, gelek kar kirine. Konfiçyus di sih saliya xwe de hizir û felsefeya xwe li hemû deverên Çînê dixwaze belav bike, ji ber ku wê demê Çîn di aloziyeke hizirî de dijiya. Belavbûna hizira Konfiçyus dibe sedem ku qiralên heyî wî bikin birêveberê dadgehê.

Sinc, zanist, dilsozî, qehremanî.

Ev her çar rêgez reftar û giyana mirov zelal û paqij dikin.

## Rêgezên bingehîn ên Konfiçyus :

Gotin, pend û felsefeya Konfiçyus ji gelek rêgezan pêk tê:

1- Hezkirin, hizkirina gel û têkiliya xweş bi gel re û gotinên xweş di axaftinê de.
2- Paqijiya dest û ziman.
3- Rêzgirtina kesên temenmezin.
4- Pîrozkirina malbatê û guhdariya kesên piçûk ji kesên mezin re û guhdariya jinê ji hevjînê xwe re.

5- Konfiçyus ji desthilatdarî û zordariyê hez nedkir.

Baweriya Konfiçyus bi hukûmetê ji bo rajeya gele dihat û ne berovajî ye, serok divê xwedînirxên sincî be û ne kesekî deshilatdar be.

Ji wan pendên ku Konfiçyus ji reftarê xwe re kirbûn bingeh, ew penda kevn a ku dibêje "tiştên tu ji xwe re dixwazî û hez dikî, ji kesên din re jî hez bike".

## Pirsên Nirxandinê

1- Rêgezên Konfiçyus, diyar bikin.
2- Gelo em dikarin hizirê konfiçyus di roja xwe ya îro de pêk bînin?

**Wane 5**

## Çand û Sincên Latînî di Baweriya Sokratês (Socrates) de

Sokratês 470-399 BZ jiyaye. Di dema jidayîkbûna Sokratês de, bajarê Atîna ketibû rewşa kirîzê. Sedema vê kirîzê nakokiya di navbera wan û Spartayê de bû, di encamê de Atîna bi bin ket û sofîsên (tevgerek felsefeyî ye) wê demê, bi tu rolê ranedibûn ji bilî ku kirîza heyî kûrtir dikirin, sîstem rûxandin û altirnatîfa wê bi pirsiyarî nedîtin û ji xwe re nedikirin xem. Ciwanên Atînayê êdî xwe berpirsyar nedidîtîn û baweriya wan bi her tiştî nema dihat û bê nirx nêzî kirîza heyî dibûn.



Sokratês bi rola xwe ya dîrokî dilîze û bingehê perwerdeya xwe ya sincî datîne, bi gotina xwe ya navdar ya "xwe nas bike" dest bi karê xwe dike.

Bi saya vê gotinê mirov dighêje zanista xwe ya taybet.

Sokratês bi rêya diyalogê, bi ciwanan re nakokiyan dixe hiş û zanista heyî û dihêle ku ji nû ve bihizirin.

Hizra giştî ya ku te pê bawer kiriye û li ser wê jiyana xwe berdewam dikî, tevî ku ew hizir pirsgirêkên te çare nake; êdî te

çavên xwe girtine û baweriya xwe bi vê hizira heyî aniye. Tevî ku ev hizir te naghîne rastiyê. Ev jî mînakek li ser felsefeya Sokratês e ya ku bi rêya diyalogê di nav ciwanên Atînayê de belav kiriye.

Sokratês di jiyana xwe de tu pirtûk nenivîsandine, bêhtirî wê erkê xwe yê sincî bi awayê giftûgoyê belav dikir.

Sokratês bi rêbaza xwe, hewl dide ku her mirov bi hizira xwe pirsgirêkan çare bike, ji ber vê yekê wî metirsî li ser deshilatdariyê çêdikir û bi sûcê xerabkirina hişê ciwanan hate sezakirin.

Xwendekarên wî pê re dicivin û dixwazin ku wî ji zindanê birevînin, lê Sokratês vê yekê napejirîne û dibêje: "Eger ez xwedî li hizr û rastiyê dernekevim, êdî mirov nema dikarin baweriya xwe bi hizirê xwe bînin".

Ji bo ku rastî neyê veşartin, piwîst e mirov bi fedakarî û bê tirs bihizire û vî hizrî li pêş bixe û belav bike.


## Pirsên Nirxandinê

- Têghiştina xwe derbarê felsefeya Sokratês de diyar bikin.

**Wane 6**

## Çand û Sincên Samîtîk di Baweriya Hz. Îsa de

Li gorî pirtûka pîroz (Incîl) Hz. Îsa li Beytulehimê ji dayîk bûye ku navê dayîka wî Meryem e. Jiyaneke paqij bê şaştî û guneh jiyan kiriye. Nameya xwe di çend salan de li Filistînê belav kir, berî ku li ser destên romanan were xaçkirin.



Di baweriya xiristiyanan de Hz. Îsa xwe kiriye qurban ji bo şûştina gunehên hemû mirovan. Ta sih saliya xwe, bi awayekî normal dijî û jiyana xwe bi dartiraşiyê derbas dikir. Di wê demê de, hemû xaka Filistînê di bin dagerkiriya romanan de bû.

Piştî sih saliya xwe dest bi karê xwe yê perwerdehiyê kir û bang li mirovan dikir ji bo ku xwe bighînin rastiya xweda û xwe nêzî wî bikin, ji bo vê jî hin tişt têne xwestin ku mirov baş bihizire û xwe ji sûnc û derwan dûr bixe û pê re giyana xwe paqij bike.

Bi sedema derhozeyên ku Hz. Îsa bi wan radibû, mirov li derdora wî pir dibûn û Hz. Îsa li hemû bajarên derdora xwe digeriya û pêxmberiya xwe nîşan dida.

## Çand û sincên Hz. Îsa:

Hz. Îsa, têkiliya hevbeş a di nav xweda û mirov de ye. Ev têkilî li ser bingehê hezkirinê ava dibe. Bi hezkirinê mirov xwe zelal û paqij dike; ji ber ku mirov wêneyek ji xweda ye û ew bi tenê dikare tevlî jiyana xweda bibe, ji ber çend sedeman:

1. Hizir: Ji bo ku afrindeyan nas bike û ji xweda hez bike.
2. Vîn: Rûmeta mirov diparêze û têkiliya mirov bi kesayeta wî û derdora wî re xurt dike.
3. Azadî: Eger mirov azad be, dê li gorî perwerdeya Hz. Îsa û bi alîkariya giyanê pîroz bixebite.
4. Aşîtî: Mirov bi aşîtiyê xwe û derdora xwe aram dike.
5. Xweşikbûn: Mirov xwe bi xweşikbûnê zelal dike û bi çand û sinc dike.

## Bawerî, daxwaza dilovanî û hizkirinê dike:

Dilovaniyê karekî pir baş dibîne û xweda jî jê hez dike, dilovanî dihêle ku mirov nezî te bibin beyî ku te nas bikin.

Hz. Îsa pirê caran banga dilovaniyê kiriye: "Divê mirov rojane bi dilovanî bijî, hem ji hundirê xwe de û hem ji der ve û bi vî awayî dê wêneya Hz. Îsa pêk bîne" (Lûka 6-36).

## Nimêj bersiva bawerî û hezkirinê ye:

Nimêj: Bilindbûna giyanê mirov ber bi Xweda ve ye û têkiliya soza di navbera Xweda û mirov de ye.

## Hevsengiya di navbera jin û mêran de:

Mirov, jin û mêr e û di xwezayê de hev temam dikin, "tu cûdahî di nav we de tune ye, hûn hemû di Hz. Îsa de yek in" (Gilatiya: 26- 28).

## Rêgezên sincên Hz. Îsa:

1. Pêwîst e mirov dilnizim be û xwe ji pozbilindiyê biparêze.
2. Pêwîst e mirov merd be û xwe ji çavtengbûnê biparêze.
3. Pêwîst e mirov ji bo xwedê her dem di rewşa amedebûnê de be.
4. Pêwîst e mirov rasteqîn û dirûst be.
5. Pêwîst e mirov dilovan be.
6. Pêwîst e sincên mirov baş be û dadmend be.
7. Pêwîst e mirov acizbûnên xwe bi bin bixe û cihê baweriyê be.
8. Pêwîst e mirov xwe ji çavnebariyê biparêze û bêhinfireh be.
9. Pêwîst e mirov aştîxwaz be û alîkariyê bide derdora xwe.

### Pirsên Nirxandinê

1- Çand û sincên Hz. Îsa çi ji xwe re dikin bingeh? Lêkolîn bikin.

**Wane 7**

## Çand û Sincên Samîtîk di Baweriya Hz. Mihemed de

Hz. Mihemed, 20'ê cotana 571'ê li Mekayê ji dayîk bûye û di 8'ê pûşbera 632'yan de li Medîneyê koça dawîn kiriye. Di 40 saliya xwe de bûyê peyamber. Di jiyana xwe ya peyamberiyê ya 23 salan de 13 salan li Mekeyê jiyan kiriye û 10 salan jî li Medîneyê jiyan kiriye. Hz. Mihemed di sala 610'an weke peyamberê ji aliyê Xweda ve ji bo tevahî mirovan hatiye nişankirin.



Piştî ku peyamber peyamên sincî di nava civakê de belav dike û banga destberdana pûtperestiyê dike, êrîşên dijwar ji milê Qureyşê ve li ser wî û kesên ku baweriya xwe pê anîne tên kirin. Ji ber vê yekê peyamber berê xwe dide Medîneyê, hem ji bo ku xwe ji êrîşên qureyşan biparêze û hem jî ji bo ku bêhtir vê nameyê belav bike.

Berî islamê şêwayê rêxistina gelên ereb pergala ku dihat meşandin pergala meclisan bû.

Gelê ererb ên ku bi awayek hozî jiyan dikirin di nav wan de her dem şer û pevçûn hebû.

Zarokên keç bi saxî dixistin bin axê. Firotina koleyan dihat kirin. Jin dihatin kirîn û firotin. Pût ji xwe re çêdikirin û

bawerêya xwe pê dianîn. Di van civakan de nirxê jinê tune ye û ji ber çêbûna zarokên keç şerm dikirin û ew bi saxî dixistin bin erdê. Di vê demê de her çendî ev qas xerabî hebin jî lê belê mirovên ku girîngî didan başî, rastî, comerdî û bisinc jî hebûn.

Di bin birêveberêya Hz. Mihemed de guherînên ku di milê civakî de hatiyê çêkirin; bawerî, dad, sinc û sererastkirina têkîliyên civakî, bi awayekî bibandor, erkê xwe bi cih aniye.

Hz. Mihemed rewşa civakê ya civakbûnê û sincî, bêmafî, xerabiyên ku dihatin jiyankirin, dixwest biguhere û sererast bike û ji bo vê yekê her dem têkoşîn dida meşandin.

## Rêgezên sincên Hz. Mihemed:

- Pêwîst e tiştên ku mirov ji ser hiş dibin, neyên vexwarin.
- Ew lawirên ku ji bo pûtan hatin qurbankirin, goştê wan neyê xwarin.
- Pêwîst e kes derewan neke.
- Soza ku tê dayîn, pêwîst e pêk were.
- Li hemberî dad û mafan, rêz were nîşandayîn.

## Nêrînên Hz. Mihemed derbarê sinc de:

- Mirovên ku sincên wan xweşik bin, di her temenî de xweşikin.
- Tiştên ku herî zêde Xweda jê hez dike, sincên baş û xweşik e.
- Çawa ku germahiya rojê qeşayê dibişêve, sincên baş jî wekî rojê gunahan dibişêvin.
- Perestinên mirov çi qas kêm bin jî, lê belê bi saya sincên baş xwe digihîne asta herî jor.
- Di nava we de, yê ku ez herî jê hez dikim, ew e yê ku taybetiyên sincê wî xweşik e.

## Pirsên Nirxandinê

1- Sedema koçkirina peyamber diyar bikin.
2- Gelên Ereb di dema peyamber de çawa jiyan dikir.
3- Sincên ku peyamber pê bang dike, di kesayeta xwe de diyar bike.

# Belavkirina Waneyan li ser Sala Xwendinê

| Heftî / Heyv | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| **Rezber** | | | Çand | Sinc |
| **Cotmeh** | Şêweyê Jiyana Civaka Xwezayî | Baweriyên Civaka Xwezayî | Totem | Perestgeh |
| **Mijdar** | Mîtolojî | Pergala Desthilatda-riyê | Pêşketina Gund û Bajaran | Pêvajoya Pêşketina Gundan |
| **Berfanbar** | Sincên Gundewari-yê | Bajarvanî | Xerabkirina Çand û Sinc1 | Xerabkirina Çand û Sinc2 |
| **Rêbendan** | Lêveger | Lêveger | Bêhinvedan | Bêhinvedan |
| **Reşemeh** | Ziman | Koma Zimanên Çanda Arî (Aryen) | Koma Zimanên Çanda Samîtîk | Koma Zimanên Ural Altayî |
| **Avdar** | Çand û Sincên Ariyen di Baweriya Zeredeşt de | Çand û Sincên Ariyen di Baweriya Manî de | Çand û Sincên Hindî di Baweriya Bûda de | Çand û Sincên Ural Altayî di Baweriya Konfiçyus de |
| **Cotan** | Çand û Sincên Latînî di Baweriya Sokratês de | Çand û Sincên Samîtîk di Baweriya Hz. Îsa de | Çand û Sincên Samîtîk di Baweriya Hz. Mihemed de | Çand û Sincên Samîtîk di Baweriya Hz. Mihemed de |
| **Gulan** | Lêveger | Lêveger | | |